Stadt **Hamm:**
*Der Oberbürgermeister*

Stadt Hamm -40- Postfach 2449 · 59014 Hamm

Ji bo
SuS Vorname Nachname
Straße
PLZ Ort

**Daîreya ji bo perwerdehiya dibistanê**
Stadthausstraße 3
59065 Hamm

**Derfetê pêwendiyê:**
Tel. 02381 / 17-5016, 5023, 5065, 5011
schulweg@stadt.hamm.de

31.05.2024
Hejmara min: 40-401
Hejmara te:

**MaxiTicketa bê pere**

Stî Name / Mîrza Name,

Hemû xwendekarên dibistanê û şagirtên perwerdehiya pîşeyî yên li Hammê dijîn di demên pêş de bê pere tên û diçin – ew sonda azwerî ya hêj di sala dibistanê ya 2023/24an bi cî hatibû ev bû.

Ez gelek kêfxweş im, ku rêwîtiya bê pere ya bi bus û trênê li lav tevahiya sînorên bajêr bi berdewamî pêkan e.
Wwekî ragihandî, MaxiTicket ji bo sala dibistanê ya 2024/2025an bi awayê dîjîtal li ber dest e. Ji bo vê yekê pêdivî bi qeydkirina li Karûbarên Bajêr heye. Da ku ev yek hêj hêsantir be, piraniya agahiyên qeydiyê dikarin bi riya QR-kodê li jêrê yekser li ser forma qeydiyê werin barkirin.
Ev bilêt ji bo sala dibistanê ya 2024/2025an derbasdar e û wekî daneya PDFê li ber dest e. Mirov dikare vê daneyê çap bike yan jî li ser telefona xwe bar bike û wisa bi kar bîne.

Ev yek bingeheke girîng e li ser riya ber bi rêwîtiya hawirdorparêz a siberojê.
Tu dikarî hemû agahiyên di derbarê MaxiTicket û Deutschlandticketê de yên ji bo xwendekarên dibistanê li ser malpera bajarê Hammê li ser www.hamm.de/schulweg/schulwegtickets bibînî.

Marc Herter
Şaredarê Serek

Stadt **Hamm:**
*Der Oberbürgermeister*

**Hişyariyên di derbarê parastina daneyan de:**

Bajarê Hammê parastina daneyên te/we ciddî digire û bikaranîna daneyan a li ser bingeha parastina daneyan ewle dike.

Bilêta rêwîtiyê ya xwendekarên dibistanê ya bi vê nivîsê re radestî te hatiye kirin, ji aliyê saziyeke xizmetguzariyê ya derveyî ve hatiye amadekirin û şandin. Ji bo vê armancê, daneyên pêwîst ên ji qeydiya nifûsê radestî vê saziya xizmetguzariyê hatiye kirin. Ev saziya xizmetguzariyê bi riya hevpeymanê ji bo bikaranîna daneyên radestkirî ya li ser bingeha parastina daneyan ya li gorî Rêziknameya Bingehîn a Parastina Daneyan hatiye mecbûrkirin (Xebata li ser daneyên peywirê). Ev dane yekser piştî bikaranîna li saziya xizmetguzariyê jê tê birin. Bi riya hevpeymanê pêşî li qeydkirin, bikaranîna wêdetir an jî bikaranîna daneyan a li dijî armancê hatiye birîn.

Saziya Berpirsyar: Stadt Hamm, Amt für schulische Bildung, Stadthausstr. 3, 59065 Hamm, Telefon 02381/17-5026 Email Amt-fuer-schulische-Bildung@Stadt.Hamm.de

Peywirdarê Parastina Daneyan a Daîreyê: behördlicher Datenschutzbeauftragter, Stadthausstr. 3, 59065 Hamm, 02381/17-5002, Email datenschutz@stadt.hamm.de

Daîreya Çavdêr: Landesbeauftragte für Datenschutz und Informationsfreiheit Nordrhein-Westfalen, Postfach 20 04 44, 40102 Düsseldorf, Telefonzentrale: +49 (0)211 / 38424 - 0